

PEYMANNAMEYA

TÜRKİYEYA NÛ YA

2023

NÎSAN 2015

PEYMANNAMEYA

TÜRKİYEYA NÛ YA

2023

NÎSAN 2015



PEYMANNAMEYA TÜRKIYEYA NÛ YA

1

Her fikre sîyasî û pergala wê divê li gor mirovan be û li gor dem û dewranê xwedî bingehê be. Pergalên sîyasîyên ku ne li gor mirov û demê bin, bi tu awayî nikarin mayînde bibin.

2

Turkîye ya nû, di vê serdema ku em ber bi 100 salîya komara xwe diçin, ewê di warê mirovahî, dem û dewranê de, bi rêya xwe nûkirineke giştî û domdar bibe berhemê pêvajoya xwe avakirina nû.

3

Em wekî nevîyên wî nifşê ku sed sal berê, li Trablûsgarbê, li Balkanan, di nava êş û elemê de, yekemîn şerê cîhanê bi serfirazî meşand û ji bo azadî û serxwebûnê têkoşîneke bi rûmet meşandin. Em xwedîyê vî welatî, yên rasteqînin.

2023



PEYMANNAMEYA TÜRKIYEYA NÛ YA

4

Dewlemendîya me ya etnikî, olî,
mezhebi û herêmî, ji bo hevparîya
rabirdûya me ya qedîm û hevparîya
welatê me û wekhevîya hemwelatîbûna
me, paldankeke pir xurte.

5

Sed sal berê, ji her alîyê erdnigarîya me
ya qedîm, ji Anatolyayê, ji Rûmelîyê,
ji Rojhilata Navîn, ji Kafkasyayê, ji bo
bapîrên me yên ku mil dane hev û li dijî
mêtingerîyê şerekî hevpar meşandine
jî, tişta ku ew ji Asyaya Navîn heta
Hindistanê, ji Rojhilatê Rojavayê
Asyayê, heta hindurê Afrîkayê bi
derfetên xwe yên tune û bi duayen xwe
piştgirî kirine jî, şerê me yê azadîyê, tenê
şerê hebûn û tunebûna miletekî nebû,
têkoşîneke pîroz bû û ji bo rûmeta hemû
mirovahîyê dihate dayîn.



PEYMANNAMEYA TÜRKIYEYA NÛ YA

6

Îro jî, ji bo Komara Dewleta Turkiye
yê rêgeza bingehîn parastina rûmeta
mirovan e.

7

Vê rêgezê, em îro jî li ser wê gotina Şêx
Edebalîyê ku bingeha bîra sîyaseta me
ya qedîm û exlaqê me yê dewletbûnê
çêkirîye û gotîye ‘Bihêle bila mirov bijîn
ku dewlet jî bijî’. Em vê gotinê îro jî
wekî zimanê sîyaseta hemdem dibinin
û kevneşopî û hemdemîyê di nava vê
çarçoveyê de li dijî hev nabînin û em
dibêjin ew nikarin ji hev veqetin.



PEYMANNAMEYA TÛRKÏYEYA NÛ YA

8

Derfeta asteke çand û aborîyeke pêşketî
û hebûna vê, ji rêgeza ‘bihêle bila mirov
bijîn’ perçekî ferasete ye û berpirsiyarîya
wê ya sereke ewe ku, derfetan çêbike ku
hemwelatî , di nav şert û mercên sîyasî û
aborî de jîyaneke bi rûmet bijîn .

9

Rûmeta mirovan, di sîyaseta me de,
di pergala aborî û çanda me de û di
politikaya me ya navneteweyî de, rîknê
herî xurt e.

10

Bi tu awayî kirin û polîtîkayên ku bi
rûmeta mirovan dilîzin meşrû nayên
dîtin û nayên nîşandayîn jî.



PEYMANNAMEYA TÛRKÏYEYA NÛ YA

11

Hemwelatîbûna Turkîye yê bi rûmeta mirovan ve hatîye sertackirin, her kesê ku xwedîyê nasnameya vî welatî ye, ji alîyê tu meqam û tu hêzî ve nikare biçûk were dîtin; ji ber bawerî, reng, zayend, ziman, netewe, fikrê xwe yê sîyasî, feraseta xwe ya felsefê û bi awayê jîyana xwe nikare were cûdakirin, bi tu awayî rê nayê dayîn ku, bi gotinên ne pak re, rû bi rû bimînin.

12

Dewlet û millet, tenê û tenê bi bawerî û têgihîştina kesên dikarin di nav dîrokê de hebûna xwe bidomînin.



13

Têgihîştina ku hemwelatî ji bo welatê xwe di bîra xwe de di hewînî û feraseta sîyaseteke ku bi tu awayî tu hemwelatîyê xwe li derva nahêle û wekî kesên din nahesibîne, ji bo hebûn û domdarîya dewletan garantîya herî bingehîne.

14

Bîr û bawerîya têgihîştinê welatan saz dike û li ser pîyan digire; hêza aborî, sîyasî û leşkerî jî wî welatî bilind dike û qaîm dike.

15

Ji bo rêgeza rûmeta mirovan, di pergala me ya qanûna esasî û sîyasî de, spartekên bîr û bawerîya têgihîştinê, dîrokeke hevpar, heq, hiqûq û hemwelatîbûneke wekhev e.



PEYMANNAMEYA TÜRKIYEYA NÛ YA

16

Dîroka hevpar, wê rabirdûya me ya
qedîm û ji bo pêşerojê têgihîştina me ya
qederê nîşanî me dide.

17

Bi sedan sale li Anatolya yê bi hevkarîyê
tomarkirina me ya şaristanîyê heye, li
ser vê tomara şaristanîyê sazûmankarîya
Selçûkî û Osmanîyan, qezencên ku ev
sed sale komarê bidestxistîye û tecrûbeya
demokrasiya ku ev pêncî sale çêbûye,
tevî serh'emdîya van sêzdeh salên dawîn,
em di nav xwebawerîyeke tam de, xwe
amade didikin ku di nav hêzên berzê
sedsala 21'emîn de cîhê xwe bigirin.



18

Di vê çarçoveyê de, di nav herikandina dîroka dinamik de armanca me ewe ku, em bi hemû alîyan ve, milletê xwe, ji bireserîya dîrokê derxin bikin kirdeyê dîrokê; dewleta xwe ya ku li ser esasê îradeya millet çêbûye, ji pasîfîya şopandina dîrokê derxin, bikin pêşeng.

19

Rêgeza hemwelatîbûna wekîhev jî riknê meşrûîyeta sîyaseta hemdeme û ev riknê han, bi tu awayî û bi tu sedemî nikare were lawazkirin, nikare neyê dîtin.

20

Dema ku em li ser vî riknê ber bi 100 salîya komara xwe diçin, pêşî em dixwazin ku welatê me, bi qanûneke esasîya ku hevpar, pir alî, azad, demokratik û sîvîl ve were rêvebirin.



21

Nirxên azadî, wekhevî û edaletê, di sazûmankariya me ya li ser rîknê qanûna esasîya nû de rêgeza herî sereke ye, referansa wê ya exlaq û rihê wê, ewê rûmeta mirovan be.

22

Rûmeta mirovan ji ber ku tenê bi hêza azadîya îrade û tercihan dikare bijî, di navenda pergala qanûna esasîya me ya nû de jî, maf û azadîyên mirovan ewê hebin.

23

Di çanda me ya qedîm de esasen parastina can, aqil, nîfş, bawerî û milk sînoren berpirsiyarîya ammeye diyardike, beyannameya gerdûnîya mafê mirovan jî hîmê jîyana civaka hemdem lidardixe û ji bo hemwelatîyan qadên azadîyên bingehîn nîşandide.



24

Di vê çarçoveyê de azadîya fikir,
bawerî, îfade û pêngavan, ji bo rûmet û
nasnameya mirovan perçekî nebê nebê
ye û di binê parastina qanûna esasî de ye.

25

Tiştên tenê van azadîyan bi sînor bike,
dîsa mafê azadîya hemwelatîyên din
ên ku xwedîyê mafên wekhevîyê ne û
rûmeta wan e.

26

Her azadî bi xwe re berpirsîyarekîyekê
tîne. Azadîya çapemenî û îfadeyê, bi xwe
re exlaqê çapemenîya ji bo jîyana taybet
hurmetê nişan dide, azadîya pêngavan bi
xwe re qezenceke meşrû û baca xwe dide,
azadîya bawerîyê jî bi xwe re hurmeta ji
bo bawerîyê din tîne.



27

Em pergala raya giştî ji bo maf û azadiyên mirovan wekî qada jîyanê dibinin; di vê çarçoveyê de, têgehên azadî û ewlehîyê, li dijî hev na, ji bo hev wekî hêmayê temaker dibinin.

28

Mirovên ku azadî ji bo wan nehatibe garantîkirin ne mimkune ku rûmeta xwe biparêzin, dîsa kesên ku ewlehîya wan tunebe, ne mimkune ku di qada azadiya xwe de bijîn.

29

Em dizanin ku dema li ser navê ewlehîyê azadî werin sînorkirin rejîmên dîktator derdikevin holê, lê dema ji bo azadiyê jî dev ji ewlehîyê were berdan, rê li pêşîya kaos û şerên navxweyî vedibe, em ahenga di navbera azadî û ewlehîyê de wekî bingeha meşrûiyeta siyasetê dibinin.



30

Meşrûiyeta sîyasî, di navbera
hemwelatîyên ku raste rast di sazkirina
pergala sîyasî de cîh girtine û di navbera
dewleta ku rûyê vê pergaleke bi têkilîyeke
rizayê çêdibe û berhemeke peyman
civakê ye.

31

Ji ber vê yekê jî, çavkanîya sîyaset û
deshilatîya meşrû, tenê ji kontrola
milletê ku ji hemwelatîyên wekhev pêk
tê çêdibe.

32

Gotineke wekî ku di sala 1921 de di
Qanûna Teşkilatî Esasî de jî hatîye ziman
û ev ji bo rêvebirina şerê azadîya me û
damezirandina komarê jî bûye bingeha
Qanûna Esasî wiha dibêje “Serwerî bê
şert û qeyd ya millet e”



PEYMANNAMEYA TÜRKIYEYA NÛ YA

33

Ev rêgeza damezirîner, wekî roja
destpêkê hatîye eşkerekirin, îro jî di
rewacê de ye; ewê sibê jî di rewacê de be.

34

Mekanîzmayên dewletê, amûrên ku li ser
civakê desthilatîyê saz bikin nînin.

35

Hemû mekanizma di binê fermana
millet de ne. Yanê yê fermandar millet e,
yê memur dewlet e.

36

Tu hêz, cunta, erkdarên wesayetê,
derdorên heverast an jî serdestên
burokrasîyê, desthilatîya xwe ya
seranser yan jî dabeşkirî, eger ku ji
millet meşrûiyeta xwe hilnegirin û ji bo
kontrola millet vekirî nebin, ji alîyê me
ve, nayên qebûlkin.

37

Ew darbeyên li dijî rêvebirinên ku
meşrûiyeta xwe ji millet girtibûn çêbûn,
yên wekî 27'ê Gulanê, 12'ê Adarê û 12'ê
Îlonê raste rast û 28'ê Sibate, 27'ê Nîsanê
û Derdorên Heverast bi rêyên din
kirin, şermezar dikin û em wekî hêzên
demokratên ku meşrûiyeta xwe ji millet
girtîne îlan dikin ku, sibe roj hewildanên
wekî van derkevin holê, emê helwestên
hevpar nişan bidin.



38

Di sala 1947'an de, hilbijartin li ser esasê 'rey dayîna eşkera û hejmartina veşarî' bû, wê salê di hilbijartina muxtaran de, xwestin ku sandoqê birevînin, li Mersînê, li gundê Arslanköy, şêrejinên Anatolya yê gotin "sandoq namusa me ye" xwe avêtin ser, tenê sandoq na, îradeya millet û rûmeta hemwelatîyan jî parastin, em demokrasiyê wekî emeneta wan a pîroz dibinin.

39

Di her hilbijartinê de, ev emanete ji aliyê hemwelatîyên me ve tê parastin derfet çêkirîye ku demokrasi kok bigire. Hilbijartinên eşkere û zelal, ji vir pê ve jî, ewê ji bo aramîya sîyaseta me ya piştî xwe daye demokrasiyê, ewê bibe rîknê herî sereke.



40

Di vê çarçoveyê de, ew mafê simbol
sandoq, mafê hatina hilibjartin
û hilibjartinê, di nav mafên
hemwelatîbûnê de mafê herî bingehîne û
ev maf bi tu awayî û bi tu sedemî nikare
were sînorkirin, tune hesibandin û
betalkirin.

41

Sertaciya komara me bi demokrasiyê
çêbûye, ev qezenceke bê vegere.

42

Komara me hevparîya yekgirtîbûna
me ye, demokrasi jî ji bo parastina
taybetmendiyên me yê di vê qada
yekgirtinê de ewlehîya me ye.

43

Armanca me ya axirî ewe ku em bi pîvanên
gerdûnî, demokrasîyê bi feraseta piralî,
wekhevî û beşdarî li seranserê jîyanê belav
bikin.

44

Emê demokrasîya temsîlî bi hemû hêmanên
wê biparêzin, emê bi hemû pêşketinên
teknolojîya demê, ji bo beşdarbûna
demokrasîyê qanalên nû peyda bikin,
demokrasîyê kûr bikin û bi distûra rêvebirinên
di cîh de, li bingehê belav bikin.

45

Di vê çarçoveyê de, emê ji bo hêzdarbûna
sazgehên civaka sivîla ku bingeha demokrasîya
piralî û beşdarî ne, derfetan çêbikin û ji bo
ku sazgehên civaka sivîl zêdetir aktif tevli
rêvebirina demokratik bibin, astengiyên li
pêşîya wan emê ji holê rakin.



PEYMANNAMEYA TÛRKIYEYA NÛ YA

46

Pergala me ya qanûna esasî, li ser cûdahîya hêzan e, dewleta demokratik û hiqûqî bi persfektîva îradeya neteweyî, ewê rê nede tu hêzên dervayî qontrolê çêbibin.

47

TBMM ya ku raste rast bi hîlbijartina millet tê ser kar, dema ku kare xwe yê qanûnsazîyê pêktîne, bi tu awayî ji alîyê tu hêzî ve nikare were çewisandin.

48

Piştî hîlbijartina 7'ê Hezîranê, yekemîn karê TBMM yê, ji bo welatê me, dîsa yekemîn car qanûnake esasîya sivîl bi feraseteke lihevkerinê nivîsandine. Em hemû pastiyên siyasî û komên sivîlê welatê xwe, ji bo çêbûna vê lihevkerinê gazî tevlêbûnê dikin.

2023



49

TBMM piştî ku qanûna esasîya sivîl were pejirandin, ewê di çarçoveya vê qanûna esasî de karê xwe yê qanûn çêkirinê û çavdêriyê bimeşîne. Ev faaliyet, ewê di çarçoveya qanûna esasî de, ji bo çavdêriyê vekirîbe.

50

Di çarçoveya rêgeza dewleta demokratik hiqûqî de, serxwebûna darazê riknekî bingehîne.

51

Ev serxwebûn bi qasî ku di têkilîyên bi hêzên din ên qanûna esasî re were parastin, ewê ji rêxistinên di nav xwe de çêbe jî were parastin û ewê nehelê juristokrasî (desthilatî dadrêsan) yan jî yên dişibin wan çêbibin.



52

Ji bo serxwebûna dadî hêmana
temamker, bi armanca parastina rûmeta
mirovan helbet, ewlehî li ser xeta hiqûq
û edaletê bi rêgeza bê alîbûnê çêdibe.

53

Di pergala hiqûqê de, ji bo her dadrêsek,
di nav normên hiqûqa objektîf de, bi
tena sere xwe û tenê bi wijdana xwe
bikaribe biryarê bide, emê rê vekin.
Biryarên dadgehan, ewê di nav distûrên
dewleta demokratîk de ji bo venêrînê
vekirîbin.



54

Di serdemên darbeyan de, ji bo hikûmetên ku bi îradeya millî hatine serkar bi sînor bikin têkilahî çêbûne û di encama vê de jî pergala parlamentoyê ji rastîya xwe û karmêşandina xwe hatîye dûrxistin. Herçiqas bi erkên xurt hatibe arastin jî, maqamê Serokkomariyê ji aliyê qiqûqê de tu berpirsiyariyê hîlnade ser mile xwe, lê maqamê Serokwezîriyê herçiqas erkên wê hatibe sînarkirin jî, hemû berpirsiyariya siyasî û hiqûqî hildide ser mile xwe, herî dawî di sala 2001'î de krîzeke aborî derket, ev krîz jî ber nakokîyên di navbera her du meqaman de derket.

55

Kargerîya dewletê ji aliyê sînorên erkan de seqet bûye û pêdivî pê heye ku erka rêvebirinê ji nû ve were sazîkirin.



56

Di erka rêvebirinê de ahenga di navbera erk û berpirsîyarîyê de divê bi tu awayî rê nede dudilîyê, eşkere were meydanê. Ev ji bo rêgeza di rêvebirinê de çalaki û hesab dayînê çêbibe pêdivîyeke heywceye.

57

Di sala 2007'an de yekemîn car reforma qanûna esasî çêbû, di sala 2014'an de jî Serokkomar ji alîyê gel ve hate hîlbijartin. Em ji ber vê dibêjin ku pergala rêvebirinê ber bi alîyê pergala Serokatîyê divê careke din were sazîkirin, ji bo ku tevlihevîya erkan ji holê rabe û hesab were dayîn em vê hewce dibinin.



58

Em pergala serokatîyê, di serê xwe de disêwirînin ku; di çarçoveya qanûna esasîya li ser rîknê azadîyê de, bi şertê qanûn çêkirin û rêvebirina serbixwe hebûna xwe biparêze, dengyên demokratîk û mekanîzmayên kontrole hebin, cûdahîyên civakî xwedîyê temsîla sîyasî bin.

59

Em hemû alîyên sîyasî û beşên civaka sîvîl, di çarçoveya rêvebirineke bi bandor û dikare hesabdar de, gazî dikin ku di vê pêvajoya ji nû sazîkirinê de pêşgîrî û alîkarîyê bikin.

60

Bi çî awayî dibe bila be, erka rêvebirinê be jî, erka qanûnçêkirinê û ya darizandinê be jî, ewê ji bo kontrola qanûna esasî vekirî be.



61

Burokrasiya sivîl û leşkerîya ku amûrên erka rêvebirinê ne, ewê bi ehliyet û liyaqata ji çanda siyaseta me ya qedîm tên, di nav distûrên rasyonel û profesyonela burokrasiya demê de xwe saz bikin û bixebitin.

62

Ji aliyê kar û erkdarîya xwe de, ewê li ber meqamê hesab, li ber desthilatîya ku bi îradeya millet hatîye ser kar, li ber otorîteya sivîl, yeko yeko û bi tevahî serî tewandî bin.

63

Desthilatîya raya giştî tenê û tenê ji aliyê erkdarên ku erka xwe bi hilbijartinên demokratik ji gel stendine were bikaranîn.



64

Di burokrasîyê de bi tu sedemî ji bo rêxistinên heverast destûr nayê dayîn. Ji bo hîyerarşîya burokrastîk û pergala dewletê xirab nebe, li dijî kirinên pergala dewletê xirab dikin, her tedbîrê were girtin.

65

Ji bo welatê me yê ku ji mêtîngerîyê sermîyan çenekirîye û xwedî çavkanîyên dewlemend nîne ji hela aborî de hêza herî mezin, demokrasîya azad, çavkanîya mirovên baş hatine perwerdekirin û erdnigarîya ji alîyê jeoekonomîyê de bê hempa ye.

66

Îro wekî ku di hemû mînakên hemdem de jî bi eşkere dixûyê, di navbera pêşdeçûna aborî û dewleta demokratik de raste rast têkilîyek heye.



67

Li welatekî ku azadiya pêngavan tunebe
û ji bo vê hiqûqeke zalal tunebe, ji
bo serdemên dirêj ne mimkune ku
razemenîyan bikişîne û pêşveçûneke
domdar pêk bîne.

68

Pêwendîyên di navbera demokrasi û
pêvajoyên aborîyê de ev 12 salên dawîne
têkilîyeke xurt heye û evê zêdetir were
kûrkin û xurtkirin.

69

Qedexyên ku em bi 3Y'ê bi nav dikin, li
dijî gendelî û feqîrîyê ye, ji bo parastina
pergala exlaqe, li ser parvekirina
qezenceke bi edalete, ji bo çêkirina
ahenga sosyo-aborî ye û di navbera
demokrasi û pêşveçûnê de têkilîyê xurt
dike, em vê yekê wekî neçarî dibinin.



PEYMANNAMEYA TÜRKİYEYA NÛ YA

70

Li dinyayê çavkanîya tu hêza aborî bi qasî çavkanîya mirovan girîng û mayînde nîne. Ji alîyê qezenca neteweyîya serê kesekî de, me ji koma qezenca jêr, me pêşveçûna xwe derxist asta jora navîn, di 12 salên dawîn de, me wekî arman daye pêşîya xwe ku em pêşveçûna xwe di nav wesfên pêngavên nû de bigîhînin qezenca herî jor.

71

Li beranberî armancên sala 2023'yan, di serdema pêngava duyemîn de, armanca me ya bingehîn pêşveçûneke li ser esasê mirovan e.



72

Di persfektîva 2023'yan de, em çavkanîya mirovên welatê xwe, digîhînin arasteya bi dinyayê re dikare reqabet bike û perwerdeyê wekî pêvajoyeke seranserê jîyanê hildidin navenda pêşveçûna xwe ya li ser mirovan.

73

Em piştgirîyeke pir mezin didin lêkolînê û razemenîyên teknolojîya bilind, em naxwazin bibin welatekî teknolojîyê xwerc dike, em dixwazin bibin welatekî teknolojîyê diafirîne. Pêşveçûna qenderî ewê bibe xwedîyê kûrahîyeke bi wesif.

74

Sîyaseta li ser rîknê rûmeta mirovan û stratejîya me ya pêşveçûnê li ser mirovan e, ji bo vê amûra me ya herî sereke, politikaya me ya li ser tenduristîyê û dewleta civakî ye.



75

Dewlet, ji bo arasa laş, rih û bîra ciwanên
me yên ku pêşeroja me ne berpirsiyare
ku bi her awayî tedbîran bigire.

76

Jinên me yê ku me bi rêya cûdakirina
pozîtîf di qanûna esasî de hildaye nav
ewlehîyê, ji bo di nav jîyana civakî de
cîhê wan xurt bibe, ewlehîyên civakî pêk
werin û di nav pergalên biryaran de cîh
bigirin bûne armanca me ya herî li pêş.

77

Ji bo di civakê de li pêşîya hemwelatîyên
me yên bi asteng hemû asteng rabin,
me ev ji bo dewleta xwe nekirîye erkekî
qanûna esasî, ev di heman demê de
berpirsiyarîyekî exlaqîye jî.



78

Welatê me yê ku di nava parzemînên
Asya, Ewropa û Afrîka de ye û di
navbera behren herî girîng û tejaneyên
aborîyê de ye, ewê ji alîyê enerjî, çandinî
û bazirganîyê de, bi stratejîyên me û bi
awayên herî çê werin nirxandin.

79

Ewê li ser rêya hevrişîma qedîm, ji bo
derbasbûna xetên enerjîyê û rêyên
bazirganîyê roleke sereke bilîze û bi vê
rêyê li ser rêgeza bendewariya aboriya
dualî hewl bide ku li herêmê qadên
aşitîyê çêbibin.



80

Di aborîyê de armanca me ya dawîn ewe ku li her alîyê welatê me, hemwelatîyên me, li gor standartên gerdûnê jîyaneke bi rûmet bijîn û çêkirina derfetên pêşveçûnê. Em hewl didin ku di dinayayê de bikevin nav 10 welatên aborîya wan herî xurt, em xwe bigîhînin wê armanca ku Mistefa Kemalê sazûmankarê komara me wekî asta şaristanîya hemdem danîbû pêşîya me û em jê derbas bikin, armanca wî bînin cîh.

81

Ji bo hebûna me ya neteweyî, pêdivîya me ya hêza aborî û pêdivîya ewlehîya neteweyî ewe ku em hewcedarîya sanayîya xwe ya neteweyî ji derva kêr bikin, di nav xwe de hêzdar bikin. Ev ji bo hebûna me sparteka herî girîng e.



82

Îro li derdora welatê me kriz hene û welatê me di nav vî agirî de giraveke aramîyê ye, emê vî nasnameyî biparêzin, ji bo vê bingeha ewlehîyê ewê were sazkerin.

83

Di politikaya me ya derva de û di kûrahîya stratejîya me de, armancên sîyasî û aborî me ji xwe re dîyar kirîye û me ji xwe re kirîye armanc ku milletê me di qada navneteweyî de bibe xwedîyê cîhekî bi rûmet.

84

Ji ber rîknê rihê me yê şerê serxwebûnê, em di her gav di politikaya xwe ya derva de, li cem bêkesan û milletên bêkes cîh digirin, em bi vê nîşandidin ku em qîmetê didin parastina rûmeta mirovan.



85

Ev nêzîkbûna me, ewê bi polîtîkayên
rasteqîn ve derbasî jîyanê bibe, ji bo
hevkarîya aşîtiya herêmî û gerdûnî bibe
vîzyoneke xweser.

86

Ji dîmenên dîrok û erdnigarîyê dema em
destpê bikin, ew dinamik û piralî ya ku
me di polîtîya derva de pejirandîye, ewê
bidome.

87

Di vê çarçoveyê de endamtîya me ya
sazgehên navneteweyî û têkilîyên me
yên tifaqê, ewê ji bo armanca hevkarîya
aşîtiya navneteweyî û aramîyê pêk were
û persfektîfa me ya stratejîka ku ji bo
endamtîya Yekîtiya Ewropayê ye, ewê
were parastin.

88

Bi welatên cînar re hevkarîya ku me di
asteke bilind de sazkirîye ewê di her qadê
de were pêşxistin.

89

Li herêmên wekî Balkanan, Kafkasan,
Asya Navîn û Rojhilata Navîn, ji bo
aramî û aşitîyê rola me ya sereke û bi
vîzyon ewê yekser were xurtkirin. Bi
taybetî di van salên dawîn de, dinya
Îslamê alozîyên navxweyî dijî û li herêma
dilê me ji bo yekîtî û aşitî çêbibe çî ji
destê me were emê bikin.

90

Polîtîkayên li ser kûrahîya Afrîka, Asya û
Amerîkaya Latîn hatine destpêkirin, ewê
bi awayekî ji dil werin dewlemendkirin.



91

Em jê bawerdikin ku, ji ber doplamsîya
me ya wijdanî, li herêmên krîza ku li
derdora me heye û li herêmên wekî
Afrîkayê pêdivî bi alîkarîyê hene,
alîkarîyên ku em ji bo mirovahîyê
didomînin, ewê li van welatên dost û
bira, şopên winda nebin bihêlin.

92

Ev hemû qadên politikaya derva, ewê
derfetan çêbike ku welatê me bibe
hêzeke gerdûnî û evê jî di çarçoveya
stratejîyeke yekgirtî de were çêkirin.

93

Di dinayyê de tu welat û cîh, ji alîyê
mîrateya şaristanîyê de, bi qasî welatê me
bi şans û dewlemend nîne.



94

Di dîroka mirovahîya qedîm de,
qonaxên modernîzm û gerdûnîyê,
li ser vê axê pirt xurt jîyane û hê jî
dijîn. Yekemîn civakên çandinîyê li
Çatalhöyükê jîyane, di nav qedîman de,
mînaka herî dawîn Stenbola Osmanîyan
e, hemû rengên dewlemendiya qedîman
li vî warî derfeta jîyanê dîtine; bi
modernîzmê re rû bi rûbûna qedîman
herî berfireh li vê ernigarîyê çêbûye. Îro
jî em bi hemû dînamîkên pêvajoyên
gerdûnîyê re ji nêz ve têkildarin.

95

Di çavkanîya me de ji bo mirovan, ji
bo demê û wargehan têgihîştineke kûr
û tecrubeyeke bê dawî heye û ji ber vê
jî em ji bo birewerîya bajar û parastina
siruştê dilzîzin.



96

Siruşt sedemê hebûna me ya ontolojik e, parastina vê deynê me yê ji bo nifşên pêşerojê ye û hewa welat, ava wê, axa wê, tava wê, çemen wê, çîyayên wê, daristanên wê û berîyên wê, emanetî têgihîştina hemwelatîyên me û berpîrsîyarîya dewleta me ye.

97

Ji alîyê mîmarî, însanî û civakî de, têgihîştina xwedî derketina bajarên herî qedîm. Divê em vê çanda dewlemend biparêzin, bajarên xwe ji dewlmendîya mirovahîyê re vekin û li dijî meydanxwestina gerdûnîbûnê divê em ji bo bajaran têgihîştineke mirov di navendê de bin bi pêş bixin û ev ji bo berdewamîya me ya çandî şertê herî bingehîne.

98

Esasê van hemû dewlemendîyên yekîtiya
çanda me rêgeza ‘di kesretê de wahdet e’
yanê ‘di piranîyê de yekîti’ ye.

99

Ev rêgez, ewê bi feraseta pejirandin,
hembêzkirin û yekbûnê ve di warê
çandê de hişyarbûneke mezin çêbike
û bêndereke mezin lidarxe; emê tu
dewlemendîyên şaristanîyan ji xwe
dûr nexin, emê bi vê bêndera çandê,
bi dewlemendîya şaristanîya xwe ya
xwedî kok, çanda gerdîniya mirovahî
dewlemend bikin, di vê asta dîroka ku
krîzeke hebûnê tê de heye, em dixwazin
ji bo şaristanîyeke nû li ser esasê rûmeta
mirovahîyê serkêşîyê bikin.



PEYMANNAMEYA TÜRKIYEYA NÛ YA

100

Turkiye, bi dewlemendiya çanda xwe, bi tecrubeya xwe ya demokrasîyê, bi ekonomîya xwe ya xurt, bi sîyaseta xwe ya feraseta wê mirov e, bi hûnandina civaka xwe ya saxlem, bi mirovên xwe yê dinamik, bi polîtîka xwe ya derva ya bi bandor, di nav alema mirovan de endamekî bi rûmete û di nav hêzên gerdûnê de jî bilind dibe. Ev bilindbûn ewê bi peymanê sala 2013'yan berê xwe bide pêşerojê.

Ahmet DAVUTOĞLU
SEROKE AK PARTI U
SEROKWEZİRE TIRKIYE

PEYMANNAMEYA
TÜRKİYEYA NÛ YA
2023

NÎSAN 2015